



Bernameya bazar û îdareyê

KURMANJI

**Bernameya bazar û îdareyê
bernameyeka pişeyî ye û
bidestxistina dîplomeya
pişeyî armanca wê ye.**

Bernameya bazar û îdareyê ji te re yê ku hez dîke di warê bazar, îdare û têkilîkariyê de kar bike.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pişeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwînî da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomînî.

DU PISPORIYÊN CUDA

Xizmeta îdareyî

- Tu dê zanyariyan li ser îdarekirin, rêberî û rêxistinê di şîrket û îdareya resmî de werbigirî. Herweha, tu dê zanyariyan li ser mitehîdî û xizmetkariyê werbigirî. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, alîkarê aborî, birêveberê IT-yê, alîkarê karûbarên bazarê, alîkarê karûbarên karmendan, alîkarê hesabkariyê yan li xizmeta mişteriyên û pêşwaziyê kar bikî.

Bazar û xizmet

- Tu dê zanyariyan li ser kirînûfirota parveyî û tevahî werbigirî. Herweha, tu dê zanyariyan li ser bazara înternetî, rêberî û şîrketgêrî û li ser mitehîdî, xizmet û têkilîkariyê werbigirî. Ev pisporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, têkilîkarê dikanê, firoşkarê dikanê, firoşkarê şîrketê, bazarker, berpirsiyarê kirînê, rewacker û di warê lojîstîk yan xizmeta mişteriyên de kar bikî.

Tiştên ku tu dê di vê bernamê de fêr bibî

Tu dê zanyariyan li ser firotin, kirîn, herikîna alavan, lojîstîk, rewackirin, berhem, branş û pêşketina tîcarî werbigirî. Tu dê fêrî karê îdarî û rêxistinî yê di şîrket û îdareya resmî de, şopandina rewşa aborî, têkilîkarî, xizmeta mişteriyên û karê konferans û pêşwaziyê bibî.

Bona mirov xwe ji ziyarên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernamê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernamê pişeyî de madeyên lîseyê yên hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernamê pişeyî de, tu dê zêdetir madeyên pişeyî, yên ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bîngehî xwendine bixwînî.

Mitehîdî, firotin û xizmeta mişteriyên, bazar, înfirasiyon û tîkilîkarî madeyên taybetmend yê hevbeş yê vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Tu dê di vê bernameyê de şiyana xwe ya hevdîtina mirovan û pêşxistina tîkilîyê bi kontaktên tîcarî û hevkarên re xurt bikî. Tu dê xwe fêr bikî ku tu li agahdariyan bigerî, wan analîz bikî û binirxînî û bibî xwediyê berpirsiyariyê û bi hişmendî tev bigerî.

Tu dê piraniya caran bi awayê projeyê bixebitî, û şiyana xwe ku tu çalak û pêşeng bi xurt bikî. Tu dê xwe ji bo hînbûna berdewam ya di jiyana karî de amade bikî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawîya Bernameya bazar û îdareyê de projeyeka lîseyê di warê pîşeyî yê ku te bijartî de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

Fêrbûna li cihê karî

Hin beşên xwendinê herî kêr 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

Şagirdîkirin

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêr nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bernamekûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werzîş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.